SERETAYÎ

# ZIMANÊ KURDÎ

# 2

## AMADEKAR

Ev pirtûk, bi sûdwergirtina ji pirtûkên Mexmûrê, ji aliyê Komîsyona Pirtûkan a Rojavayê Kurdistanê ve hatiye amadekirin.

**Ev pirtûk, ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

# NAVEROK

**BEŞA 1** .......... 5

XWENDEKAR .......... 5
EM BIXWÎNIN Û GUHDAR BIKIN .......... 8
MIJARA SERBEST .......... 10
PÎVOKÊN ZOZANAN .......... 10
ABECEYA ZIMANÊ KURDÎ .......... 11
ZIMAÊ KURDÎ .......... 13
GUHDARKIRIN .......... 15
MAMOSTEYA HÊJA .......... 17
XWEDANENASÎN .......... 19
NIVÎSÎNA TÎPÊN BIÇÛK .......... 21
GOGA MIN .......... 23
MIJARA SERBEST .......... 27
DEMSAL .......... 27
XEWA LI BIN KULAVÊ SPÎ .......... 28
DAXWAZA AXAFTINA BI PIRTÛKÊ RE .......... 31
TEST 1 .......... 33

**BEŞA 2** .......... 34

SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ .......... 34
BEHLÛL Û DEH KER .......... 36
MIJARA SERBEST .......... 38
EY FELEK .......... 38
GUR Û ROVÎ .......... 39
GOREYA ZINAR .......... 41
MORÎ Û ÇIRÇIRK .......... 44
ŞÊR Û MIŞK .......... 46
LÎSTOK .......... 48
NAMEYA AMARA .......... 49
HÊZ DI YEKÎTIYÊ DE YE .......... 52
EM BI BERFÊ DILÎZIN .......... 54
TEST 2 .......... 57

**BEŞA 3** .......... 58

MAMIK .......... 58
KURDÎ XWEŞ E .......... 60
HINDO Û RINDO .......... 61
XAÇEPIRS 1 .......... 63
NEXWEŞIYA DAYÎKÊ .......... 64
MIJARA SERBEST .......... 66

CEJNA 8'Ê ADARÊ ........ 66
HÊLÎNA PAQIJ ........ 68
ADAR E ........ 70
NEWROZ Û ZAROK ........ 72
ROJBÛNA HERJÎNÊ ........ 74
PÊKENOK ........ 76
XEZAL Û MASÎ ........ 77
GURÊ NALBEND ........ 78
TEST 3 ........ 80

**BEŞA 4** ........ 81

RÊHEVAL ........ 81
MORÎ Û KEVOK ........ 84
DARA HINARÊ ........ 86
SÊ PERPERÎK ........ 88
AMÛRÊN ME YÊN DIBISTANÊ ........ 89
19'Ê TÎRMEHÊ ........ 90
GOTINÊN PÊŞIYAN ........ 92
DAYÎKA MIN ........ 93
COTKAR Û DAR ........ 95
MAMIK ........ 97
DU PÊŞBIRKVAN ........ 98
HEVALÊN MIN ........ 100
TEST 4 ........ 101

# BEŞA 1

## XWENDEKAR



Piştî bêhnvedana havînê, sala me ya xwendinê dest pê kir. Em hatin dibistanê. Me gelek hevalên xwe yên par dîtin.

Mamoste em rêz kirin. Xêrhatina me kir. Paşê em derbasî refê bûn. Karê ku me di bêhnvedana havînê de kiribû, mamoste ji me pirsî û me jî qala karê xwe kir.

Mamoste got:

-Niha em diçin refa duyem. Pêwîst e em ji par bêhtir bixebitin. Waneyên me yên îsal berfirehtir û cudatir in. Heke em li ser waneyên xwe baş bixebitin, em ê bi ser bikevin.

## Wateva Pevvan

**Wane:** Ders
**Derbasbûn:** Borîn
**Xebitîn:** Karkirin

## Em Têbigihin

**1-**Xwendekaran li dibistanê kî dîtin?
**2-**Mamoste ji xwendekaran re çi got?
**3-**Çima pêwîst e em îsal bêhtir bixebitin?

## Rêziman

- Hevok bi tîpa mezin dest pê dike.
- Xal (.) li dawiya hevokan tê bikaranîn.
- Peyvên li jêr di nava hevokê de bi kar bînin.

**Xal:……………………….**
**Wane:……………………….**
**Havîn:………………………..**

Valahiyên hevokên li jêr ên ku ji mijara jor hatine girtin dagirin.

Me gelek hevalên xwe yên …..... dîtin.

……….. em ji par bêhtir bixebitin.

Heke em li ser ……….. xwe baş bixebitin, em ê …………….

## Em Bixwînin û Guhdar Bikin

Mijarê ji mamoste guhdar bikin. Dema hûn guhdar dikin, bila çav û guhên we li mamoste bin.

Bi tiştên wekî pênûs û jêbiran nelîzin.

Dema hûn bêdeng dixwînin, lêvên xwe nelivînin. Di dilê xwe de bixwînin.

Di xwendina bideng de hewl bidin da ku hûn jî weke mamoste bixwînin.


# Rûniştina Di Refê de

Ez li pişt Rûbarî rûdinim.

Ez li rastê Rengînê rûdinim.

Ez li çepê Xezalê rûdinim.

Ez li pêşiya Egîdî rûdinim.



# MIJARA SERBEST

## Pîvokên Zozanan





Pîvokên li zozanan
Gulên xan û eywanan

Bermayên xaka pîroz
Narîn û şeng û dilsoz

Ji bo me mûm û çira
Hêja ye koçik û sera

Dengê azadiya gelan
Hûn hêviya mirovan

# ABECEYA ZIMANÊ KURDÎ



| TÎPÊN MEZIN | |
|---|---|
| A - B - C - Ç - D - E - Ê - F - G - H - I - Î - J - K - L - M | |
| N - O - P - Q - R - S - Ş - T - U - Û - V - W - X - Y - Z | |
|  |  |
| **TÎPÊN BIÇÛK** | |
| a - b - c - ç - d - e - ê - f - g - h - i - î - j - k – l – m | |
| n - o - p - q - r - s - ş - t - u - û - v - w - x - y - z | |
|  |  |
| **TÎPÊN DENGDAR** | |
| B - C - Ç - D - F - G - H - J - K - L - M - N | |
| P - Q - R - S - Ş - T - V - W - X - Y - Z | |
|  |  |
| **TÎPÊN DENGDÊR** | |
| A - E - Ê - I - Î - O - U - Û | |

## HÎNDARÎ

Van pendan bixwînin, kite bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.

- **Bi guleke gulistan nabe.**
  **Bi gu-le-kê gu-lis-tan na-be.**
- **Heta kefa dest reş nebe, tama dev xweş nabe.**
- **Kaniya te av jê vexwar, gemar neke.**
- **Aqil taca zêrîn e, di serê her kesî de nîne.**
- **Kedkarê xwe be, şirînê ber dilê hevalê xwe be.**





# ZIMANÊ KURDÎ

**Bi xeml û rewş e**
**Şirîn û xweş e**
**Şirîn û xweş e**
**Zimanê Kurdî**

**Bi xweş awaz e**
**Letîf û naz e**
**Letîf û naz e**
**Zimanê Kurdî**

**Beyta Feqî ye**
**Kubra Xanî ye**
**Kubra Xanî ye**
**Zimanê Kurdî**

**Bi xeml û rewş e**
**Şirîn û xweş e**
**Şirîn û xweş e**
**Zimanê Kurdî**

**Qewqeb çiyan e**
**Kubra Teyran e**
**Kubra Teyran e**
**Zimanê Kurdî**

*Şikoyê Hesen*






## Amûrên Min ên Waneyê

**Amûrên her waneyekê cuda cuda ne. Navê amûrên li jêr li binê wan binivîsin.**




......................



......................




......................



......................





......................



......................



......................



**Jimartek**

# GUHDARKIRIN



Xebat di refa 2/A'yê de dixwend. Rojekê mamosteyê wan nehatibû. Mamosteyê erkdar, ew li ser refan belav kirin. Xebat û pênc hevalên xwe jî çûbûn refa 2/B'yê.

Bi hatina mamoste re hemû xwendekar rabûn û piştî rojbaşê, li cihê xwe rûniştin. Waneya wan zimanê Kurdî bû. Mamoste çi dipirsî, xwendekaran destê xwe radikir û bersiv didan. Dema xwendekarek diaxivî, xwendekarên din hemûyan guhdar dikirin. Xebat û hevalên xwe ji van tevgeran pir hez kiribûn.

Ev tevger di refa wan de jî hebûn, lê cardin hinek xwendekar bê destûr diaxivîn.

Roja din Xebat, di refa xwe de tiştên ku jiyayî, bi mamoste û xwendekaran re parve kirin. Ji hemû hevalên xwe xwest ku êdî ew jî bi vî awayî tev bigerin.

## Wateya Peyvan

**Erkdar:**Nobedar
**Maf:** Heq
**Destûr:** Rêdan

## Rêziman

- Tîpa destpêka navê mirovan mezin tê nivîsîn.

- Xêzika axaftinê (-) di destpêka axaftina kesekê/î de tê bikaranîn.

## Hîndarî

- Peyvên li jêr di nava hevokê de bi kar bînin.

Xebat:……………………..
Mamoste: …………………..
Xwendekar: …………………

# MAMOSTEYA HÊJA

**Mamosta min Hîwa ye**
**Zana û şareza ye**
**Ez pir jê re rêzdar  im**
**Çi qas bêjim hêja ye**

**Ew pir ji min hez dike**
**Min fêrî tîpan dike**
**Raman, zanist û jimar**
**Çi qas bêjim hindik e**

**Waneyên van pirtûkan**
**Fêr dike me biçûkan**
**Wêne, mûzîk û exlaq**
**Bajar, gund û sûkan**



## Wateya Peyvan

**Şareza:**pispor, zana, Pêşketî
**Raman:** Hizir, Fikir
**Sûk:** Bazar

## Em Têbigihin

1- Li gorî helbestê, navê mamosteya zarokan çi ye?
2-Mamoste çi fêrî zarokan dike?
3-Divê xwendekar çawa nêzî mamosteyên xwe bibin?

## Rêziman

**1-** Hevokên di helbestê de bi tîpên çawa hatine destpêkirin?
**2-** Navên taybet bi tîpên çawa tên nivîsîn?
**3-** Valahiya li jêr dagirin.
… ………jê re rêzdar im.
Min fêrî ……  ……

## xwedanenasîn

Navê min Derya Medî ye. Ez li Qamişlo ji dayîk bûme. Heşt salî me. Li dibistana Ş. Osman Silêman di refa duyem de dixwînim. Navê dayîka min Delal Medî ye, navê bavê min Zinar Medî ye.
Dayîka min mamoste ye. Bavê min jî karker e. Ez herî zêde ji xwarina kutilkan, lîstika destmalê û xwendina pirtûkan hez dikim.



## Wateya Peyvan

**Qamişlo:** Navê bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye.
**Kutilk:** xwarineke Kurdî ye.

## Em Têbigihin

1- Derya çend salî ye?
2- Navê dayîk û bavê wê çi ne?
3-Navê dibistana wê çi ye?
4-Derya herî zêde ji kîjan xwarinê hez dike?

# NIVÎSÎNA TÎPÊN BIÇÛK

Tîpên li jêr bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.

b e x v d j ê f r z h i s m î k p l a n q o ş
t u ç û c w g y




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-** Helbestê ji mamosteyê xwe guhdar bikin.

**2-** Çend caran bê deng bixwînin.

**3-** Bi qasî 30 cm’yan pirtûkê ji çavên xwe dûr bigirin û bixwînin.

**4-** Dema hûn dixwînin û guhdar dikin, rast rûnin.






# GOGA MIN

Goga min reng bi rengî
Bi tep û rep û dengî

Dema min diborînî
Xemên min direvînî

Ji lîstina te têr nabim
Bi te re xemgîn nabim

Wextê radibî esman
Şa dibim ji dil û can

Bilind dikim du destan
Da te bigirim bi asan



**Dengê Penaber**

## Wateya Peyvan

**Asan:** Hêsan
**Xem:**Kul û derd
**Şabûn:**Kêfxweşbûn

## Em Têbigihin

**1-**Çima zarok her du destên xwe bilind dike?
**2-**Zarok çima xwedî li goga xwe derdikeve?

## Hîndarî


- Rêzikên li jêr bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.

"***Dema min diborînî***
***Xemên min direvînî***"

**1- Navê dibistana xwe bêjin û bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.**

**2- Nav, paşnav, ref û jimara xwe ya dibistanê di lênûsa xwe de binivîsin.**

**3- Nav û paşnavê endamên malbata xwe binivîsin.**



Ji bo tu bigihî xwarina ku jê hez dikî, divê tu di şopa lawirên bi bask de herî.

Gelo Baran ji kîjan xwarinê hez dike?



# MIJARA SERBEST

## DEMSAL




Sal, ji çar demsalan pêk tê: bihar, havîn, payîz û zivistan.

Di biharê de hewa hênik dibe. Kulîlk vedibin û xweza ji xewê radibe.

Havîn pir germ e. Mirov cilên tenik û vekirî li xwe dike.

Di payîzê de hewa sar dibe, pelên daran zer dibin û diweşin.

Zivistan mizgîniya berfê ji zarokan re tîne. Hewa pir sar dibe û wê demê mirov cilên xwe yên stûr li xwe dike.

# XEWA LI BIN KULAVÊ SPÎ

Rojekê payîz hat û dinya hênik bû. Hêdî hêdî ber bi sermayê ve diçû. Daran pelên xwe diweşandin. Ji dayîka mezin xwezayê pirsîn:

-Em gelek westiyane. Ji havînê ve em di kar de ne. Pêwîstiya me bi xewê heye. Em dixwazin demekê razin.

Xwezayê got:

-Bila, xwe amade bikin, ez ê kulavekî spî ji we re rêkim.

Pelan got:

-Em ê çi bikin?

Dayîka xweza got:

-Hûn bi dilê xwe ne.

Hûn dixwazin bilîzin,

dixwazin razin.

Pelan got:

-Baş e. Em ê bêhnekê

bilîzin, li dora dayîka xwe

kom bibin û piştre razin.

Dar jî ketin xewa zivistanê.

Ta biharê di xewê de man.



## Wateya Peyvan

**Xweza:**Sirûşt
**Kulav**: Merşeke ji hirî pêk hatiye.
**Kulavê spî:** Di wateya berfa zivistanê de hatiye bikaranîn


## Em Têbigihin

**1-** Çima daran dixwestin razin?
**2-** Piştî razana daran çi hat serê pelan?
**3-** Bûyera di mijarê de, di kîjan demsalê de çêbûye?

## HÎNDARÎ

Hezkirina her zarokekî cuda cuda ye û ne yek e. Hinek kes ji sewalan, hinek jî ji lîstokê hez dikin. Divê mirov li hember van rewşan rêzdar be.





## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Dema hûn bê deng dixwînin, çavên xwe fêrî xwendina bilez bikin.
Di xwendinê de li van şiyar bin.

- Tilî û pênûsa xwe li ser rêzikan negerînin.
- Serî û destên xwe nelivînin.



# DAXWAZA AXAFTINA BI PIRTÛKÊ RE



Dîcleya biçûk sibê zû ji xewê rabû. Pirtûka xwendinê ya birayê xwe Firat hilgirt û pelên wê vegerandin. Li wêneyên pirtûkê nêrî; xwest bixwîne, lê nekarî bixwîne. Ew hêj pênc salî bû. Gelek çîrok ji dapîra xwe guhdar kiribûn. Dapîra wê gotibû, ev di pirtûkan de nivîsî ne. Ji ber wê yekê Dîcleyê got:

- Pirtûka ciwan, pirtûka biçûk, çîroka "Dîk û Rovî" ji min re bêje, lê pirtûk bê deng ma.

Dîcleyê ji dayîka xwe pirsî:

- Dayê, ji bo vegotina çîrokan, ez ji pirtûka birayê xwe hêvî dikim, lê ew bêdeng dimîne. Gelo, ew ji min xeyidî ye?

- Na keça min, pirtûk naxeyide.

- nexwe wê kengî bi min re biaxive?

- Wê niha biaxive keça min.

Dayîka wê, pirtûka xwendinê ya Firat ji ser mêzê rakir û dest bi xwendina çîroka "Dîk û Rovî" kir.

Dema Dîcleyê li çîrokê guhdar dikir, di hembêza dayîka xwe de niviya.

## Wateya Peyvan

**Dapîr:** Dayîka dê yan jî bavê mirov
**Vegerandin:** Qulipandin, zivirandin
**Niviya:** raza, raket

## Em Têbigihin

**1-** Dîcleya biçûk dema sibê zû rabû, çi kir?
**2-** Dîcleyê ji pirtûkê çi hêvî dikir?
**3-** Pirtûka Firatî çawa pê re axivî?

## Rêziman

Tîpên destpêka nav û paşnavan mezin tên nivîsîn.

## HÎNDARÎ

Sûdên pirtûkê, bi hevalên xwe re parve bikin.
Di dema parvekirinê de li van xalan şiyar bin:


- Heta hûn mafê axaftinê nestînin, nepeyivin.
- Di refê de bi dengekî ku hemû hevalên we bibihîzin baxivin.
- Pêwîst e hûn lênûs û pirtûkên xwe berg bikin.
- Ji bo di nava lênûsa we de rûpelên vala nemînin, pêwîst e hûn baldar bin.

# TEST 1

**1- Ji vebijêrkên li jêr ya rast nîşan bikin?**

**a-Nîşaneya xalê (.) li kû derê tê bikaranîn?**

**1-** Li dawiya peyvê.
**2-** Li dawiya hevoka pirsyarî.
**3-** Li dawiya hevokê.



**b- Çend tîpên zimanê kurdî hene?**

**1-** 30
**2-** 31
**3-** 32

**2- Ji hevokên li jêr, ya rast bi (R) û ya çewt bi (Ç) nîşan bikin:**

**a-**Jimara tîpên dengdêr di zimanê Kurdî de heşt in (…)
**b-**Tîpa destpêka navên taybet biçûk tê nivîsîn (…)
**c-**Wateya peyva xweza, sirûşt e (…)

**3-Valehiyên li jêr li gorî helbesta "Goga min" dagirin:**

- Goga min ….. … rengî
- … ….. û rep û dengî

# BEŞA 2



## SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ

Li newaleke kûr bûm
Dareke pir dirêj bûm
Ser û binê xwe ter bûm
Bi çiq û belgên kesk bûm



Rojekê hat min birek
Li xakê kirim dîrek
Winda kir ev şox û şeng
Min xirkandin bi kotek



Ketim mekînê bi lez
Ez hûr kirim gez bi gez
Hin şol çêbûn lez bi lez
Min dît ez bûme kaxez



Niha jî pirtûkek xweş
Zarok bi min dil bi geş
Min dixwînin çavên reş
Ji kêfa bûm gula geş

**Dengê Penaber**

## Wateya Peyvan



**Birek:**Amûra qetkirin û birînê.
**Xak:** Erd, ax
**Dîrek:** Stûn
**Mekîne:** Dezgeh, amûra bi motor
**Gez bi gez:** Qet-qet, parçe-parçe

## Em Têbigihin

**1-** Berî ku dar bê birîn, dareke çawa bû û li kû derê bû?
**2-** Piştî kîjan bikaranînan, dar bûye kaxez û pirtûk?
**3-** Çima zarok dilgeş bûn?

## Rêziman


- Sergotara her mijarekê heye, Sergotara helbesta jor çi ye?
- Ji navên ku yek tiştî tenê didin diyarkirin re **navê yekjimar** tên gotin.
- Li ser navê yekjimar qertafên "**an** û **ên**" tên pêvekirin û dibin **navê pirjimar**.

- Pirjimarî di nava hevokê de diyar dibe.

**Mînak:**

| <u>**Yekjimar**</u> | <u>**Pirjimar**</u> |
|---|---|
| **Pirtûk** | **Tu pirtûkan bîne.** |
| **Birek** | **Ew birekan tûj dike.** |
| **Çav** | **Çavên min têşin.** |

# BEHLÛL Û DEH KER



Rojekê Behlûl ji riyeke dûr vedigeriya û westiyabû. Li aşê ku di riya wî de bû rawestiya û bêhna xwe veda. Ber êvarê, dema ku dê biketa ser riya xwe, aşvan jê re wiha got:

-Behlûl, tu mirovekî xêrxwaz î. Li dera hanê, deh ker hene. Li yekî siwar bibe û wan bi xwe re bibe gund.

Behlûl ev yek pejirand. Li yekî siwar bû, yên din jî dan pêşiya xwe û ket ser riya gund. Di rê de dinya tarî bû. Tirsek ket dilê Behlûl û got:

-Ka ez van keran bijmêrim. Kerên xwe Jimartin, neh ker bûn.Yek jê kêm bû.

Got:

-Ka ez peya bibim û bijmêrim. Lê nêrî, deh in! Dîsa li kerekî siwar bû.

Riya xwe berdewam kir.

Gelek di ser re neçû, careke din ker jimartin, neh bûn! Ji kerê ku lê siwarbûyî peya bû û jimartin, deh bûn. Serê xwe rakir û got:

-Her cara ez li kerekî siwar dibim, yek jê kêm dibe. Ya baş ew e, ji vir û pê de heta gund ez peya biçim.

## Wateya Peyvan

**Aş:** Cihê ku dexil lê tê hêran
**Ber êvarê:** Piştî nîvro, nêzîkî êvarê
**Pejirandin:** Erêkirin, qebûlkirin

## Em Têbigihin

**1-** Kesê ku di pêkenokê de behsa wî tê kirin kî ye?
**2-** Kerên Behlûl çend bûn?
**3-** Di vê pêkenokê de hûn bi kîjan peyv û tevgerên Behlûl kenîn?

## Rêziman

Di sergotara pêkenokê de çend peyv hene? Sergotar bi tîpên çawa hatiye nivîsîn?

## HÎNDARÎ

"**Ker**", lawirekî kedî ye.
Ji nav van lawirên li jêr, lawirên kedî diyar bikin:

| | | |
|---|---|---|
| ***hesp*** | ***ga*** | ***sivorî*** |
| ***hirç*** | ***bizin*** | **pisîk** |


Navê lawirên kedî yên ku hûn dinasin, di lênûsa xwe de binivîsin.


# MIJARA SERBEST

## EY FELEK

Ey felek felek
Ey zalim felek
Kanî Kurdistan
Ka Birca Belek…

*Cegerxwîn*





# GUR Û ROVÎ



Gundiyan bîrek kolabû. Du dewl li ser girê dabûn. Dema ya tijî bi jor diket, a vala jî dadiket jêr. Roviyekî tî xwe avêt dewlê û daket binê bîrê. Piştî ku têr ava sar vexwar li jor nêrî û ji tirsa behitî!

"Ez daketim lê nehizirîm, ka çawa derkevim."

Ji nişka ve gurekî xwe li ser bîrê xwar kir. Rovî bi kêfxweşî gazî gur kir:

Tu çima radiwestî? Tu jî were vexwe.

- Ez ê bêm, lê çawa?

- Ew dewla din jî, me ji bo te amade kiriye.

Gur xwe avêt dewla vala û dest bi daketina jêr kir.

Rovî jî hilkişiya jor. Di nîvê rê de rastî hev hatin.

Gur jê pirsî:

- Erê, tu yê bi kû ve biçî?

- Min ava xwe vexwar. Ez diçim jor.

- Ez ê çawa derkevim?

Rovî got:

- Te tenê daketin ji min pirsî bi xatirê te…

## Wateya Peyvan

**Dewl:** mencelok, bêrdoş, satil
**Behitîn:**ji tirsa renguherîn, şaşmayîn

## Em Têbigihin

**1-** Rovî çima daket bîrê?
**2-** Rovî, ji bo ku ji bîrê derkeve, çawa gur xapand?
**3-**Navê kîjan lawiran, di vê çîrokê de derbas dibe?

## Rêziman

- **Tîpa destpêka hevoka li jêr, çawa hatiye nivîsîn?**
  **Têr ava sar vexwar.**
- **Li dawiya hevoka jor, kîjan nîşane hatiye bikaranîn?**

# GOREYA ZINAR



*Zinar*: Dayê tu dikarî goreyeke hirî ji min re çêkî?

*Dayîk*: Kurê min, dema ku min hirî peyda kir, ez ê ji te re çêkim.

*Zinar*: Em ê hiriyê ji kû derê peyda bikin?

*Dayîk*: Ji mihê.

*Zinar*: Miha delal, tu dikarî hin hirî bidî min?

*Mih*: Hiriya min kurt e. Ji mêrgê re bêje bila giyê bide min. Ji bo hiriya min dirêj bibe.

*Zinar*: Mêrga hêşîn, tu dikarî giyê bidî miha delal.

*Mêrg*: Ez ê bidim, lê ji ewran re bêje, bila baranê bibarînin, ji bo giyayê min boş bibe.

Zinar: Ewrên xweşik, hûn dikarin li ser vê mêrga hêşîn baranê bibarînin.

*Ewr*: Çima nebarînin? Lê ji bayî re bêje, bila me bibe raserî mêrgê.

*Zinar*: Bayo, giyana min, tu dikarî van ewrên bedew bibî raserî mêrgê.

Bayî, ewr birin raserî mêrgê. Baran barî. Giya boş bû. Hiriya mihê dirêj bû. Şivanî hirî birî. Dayîkê ew şûşt, şeh kir û rist. Ji bo kurê xwe, goreyeke xweşik çêkir.

Ew zivistan pir sar bû û goreya hirî piyên wî germ kirin.

## Wateya Peyvan

**Mêrg:** Cihê têrgiya, çîmen, şînatî
**Mih:** Peza spî, mêşin
**Boş:** Mezinbûn, gurbûn û bilindbûna giyayî

## HÎNDARÎ

Zinar, ewr, mêrg, mih û dayîka ku di mijarê de ne, zindî bikin. Pênc kes bi hev re bixwînin.

## Em Têbigihin

**1-**Zinar çi ji dayîka xwe xwest?
**2-** Dayîkê, çi bersiv da?
**3-** Piştre Zinar bi rêzê ve bi kîjan heyînan re axivî?

## Rêziman

1- Di hevoka jêr de nîşaneya pirsê hatiye bikaranîn.

*Miha delal, tu dikarî hinek hirî bidî min?*

2- Peyvên li jêr bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin.

*baran - ba - ewr*


RASTNIVÎSA TÎPÊN BIÇÛK Û MEZIN

**A - B -C - Ç - D - E - Ê - F - G - H - I - Î - J - K - L - M - N - O - P - Q - R - S - Ş - T - U - Û - V - W- X - Y - Z**

**a - b - c - ç - d - e - ê - f - g - h - i - î - j - k - l - m - n - o - p - q - r - s - ş - t - u - û - v - w - x - y - z**

Tîpên li jor bi destnivîsê di lênûsa xwe de binivîsin.

# MORÎ Û ÇIRÇIRK



Hebû tunebû, çirçirkek û moriyek hebûn. Kar û xebata wan ji hev cuda bû. Çirçirkê di havînê de kêf dikir û tenê bi tilîliyan ve mijûl dibû. Te digot qey her tim wê dinê ji bo çirçirkê havîn be. Rojên teng qet nedianîn bîra xwe.

Moriya reş jî cîrana wê bû, gelek caran guh dida tilîlî û govenda wê, lê tu carî ew ji xwe re nedikir mînak. Moriya reş her tim bi kar û xebatê ve mijûl dibû. Ji bo rojên teng û zivistanê xwe amade dikir.

Êdî dem derbas bû, zivistan hat, dunya ket çileya reş, ba û baran bi ser wan de hatin. Moriya kedkar ket kuna xwe û kêf kir. Lê tiştekî çirçirka havînê nebû ku bixwe. Çû ber deriyê cîrana xwe moriyê û got: Ka hinek xwarinê bide min. Moriyê got: Xwarin ji te re tune ye. Ma ev rojên teng

nedihatin bîra te, de ka here careke din bilîlîne. Çirçirka bêxem, bi zikê birçî û perîşan riya xwe girt û çû ...

## Wateya Peyvan

**Çirçirk:** Kêzika havînê
**Kedkar:** Yê kedê dide
**Tilîlî:** Awazeke xweş, lîlandin
**Mînak:** nimûne

## Em Têbigihin

1-Kar û xebata çirçirkê çi bû?
2-Gelo moriya reş, çirçirka havînê ji xwe re dikir mînak?
3-Dema ku çirçirkê xwarin ji moriyê xwest, moriyê çi jê re got?

## HÎNDARÎ

Hûn jî çîrokekê li ser lawiran di refê de bêjin.

# ŞÊR Û MIŞK



Rojekê şêrek li binê siya darekê razayî bû. Di wê demê de, mişkek ji binê axê derket û ket nava pencên şêr. Mişk, pir tirsiya ku şêr wî bixwe. Lê mezinê daristanê, li xwe negirt ku xwe tevlî mişk bike. Ji ber mezinahiya xwe mişk nexwar.

Mişk got:

-Bawer neke ku ev qenciya te dê vala biçe.

Şêr, rojekê ji daristanê derket û ket davê. Ne xwevekutan û ne jî nirîna wî, bandor li davê nekir. Mişkê birêz, bezî û bi diranên xwe dav kiritand. Dav qetiya û şêr jî azad bû.

Gotina mişk hat bîra wî û wiha got:

- Karê ku qencî dike, ne hêz û ne jî dijwarî dikare bike.

## Wateya Peyvan

**Nirîn:** Dengê ku şêr derdixîne
**Dav:** Xefik, feq, telî, tepik
**Daristan:** Cihê ku dar lê pir in

## Em Têbigihin

**1-** Bûyera vê mijarê, di navbera kê û kê de çêbûye?
**2-** bi rêzê ve çi bi serê van her du tebayan hat?
**3-** Em dikarin çi encamê ji vê mijarê derxin?

## HÎNDARÎ

**1-** Ji derdora xwe çîrokekê guhdar bikin û binivîsin.
**2-** Bûyerên di çîroka ku we guhdar kirî de binivîsin.
Peyvên li jêr di nava hevokê de bi kar bînin.
Lawir- Şêr- Mişk
Valehiya di hevoka jêr de dagirin.
........... neke ku ew qenciya te, dê vale biçe.
Vê hevoka li jêr pênc caran binivîsin.
" Yê qenciyê bike, dê qenciyê bibîne."

## LÎSTOK

**Heval hevaloşkê**

Heval hevaloşkê
Nan û penîroşkê
Hevalê min şivan e
Gopalê wî pan e
Ji bo guran derman e

**Veşarkanê**

Ooooo
Êkê mêkê
Qirika çûkê
Şah bilbilê
Textê çilê
Çil çîzanê
Ava rengê hezarayê
Gur gureyê
Bîst li teyê
Xwe veşêrin, va hatim we

# NAMEYA AMARA



Hevala hêja Zozan:

Ew nameya ku we ji bo min rêkirî, min girt. Ez gelek pê dilşa bûm. Dayîk û bavê min jî gelek pê kêfxweş bûn.

Heke tu pirsa dibistana min a nû dikî, ez ê ji bo te vebêjim. Em jî weke we di dibistanan de zimanê xwe dixwînin. Ez, ji heval û mamosteyên xwe gelekî hez dikim. Min pir bêriya we û Mexmûrê kiriye. Ez, li Kobanê di Dibistana Seretayî ya Ş. Viyan de, refa duyem dixwînim.

Bi hêviya ku careke din em hev bibînin.

Silav û Rêz
Amara Firat

## Wateya Peyvan

**Kobanê:**Bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye
**Dilşa:** Şabûna dil, dilxweşî

## Em Têbigihin

**1-**Amara li ku derê dixwîne?
**2-**Bajarê Kobanê, li kîjan parçeyê Kurdistanê ye?

## Rêziman

**1-** Hevokên li jêr di lênûsa xwe de binivîsin û li dawiya wan nîşaneyeke hevokê bi kar bînin.

Dayîk û bavê min jî gelek pê kêfxweş bûn
Ez gelek pê dilşa bûm

**2-** Peyvên li jêr di nava hevokekê de bi kar bînin. Wan hevokan di lênûsa xwe de binivîsin.

*Name* | *Sosin* | *Zozan* | *Mamoste*





## HÎNDARÎ

Ji hevaleke/î xwe re nameyekê binivîsin. Li dawiya nameya xwe nav û paşnavê xwe binivîsin.

Nameya xwe bixin namedankekê, li ser namedankê navnîşana xwe û ya hevala/ê xwe binivîsin.



# HÊZ DI YEKÎTIYÊ DE YE



Çar zarokên cotkarekî hebûn. Zarokên wî, li hev nedikir. Cotkarî ji wan re digot:

- Ji hev hez bikin, alîkariya hev bikin.

Lê zarokan guh nedida van şîretan.

Rojekê cotkar gazî zarokên xwe dike û ji wan re dibêje:

- Ka deh şivikan bînin.

Zarokan, deh şivik anîn. Dan bavê xwe. Cotkarî ev şivik bi hev ve girêdan û kirin gurz. Yek bi yek da destê wan û got:

- De ka bişkînin.

Zarokan kir û nekir nekarîn vê gurza şivikan bişkînin. Cotkarî gurza şivikan vekir. Şivik yek bi yek da zarokên xwe. Vê carê zarokan bi hêsanî şivik şikandin. Li ser vê yekê, cotkarî ji zarokên xwe re wiha got:

- Vaye hûn dibînin, ên ku dibin yek, dibin hêz û qewet; Ên ku nabin yek winda dibin yek bi yek.

## Wateya Peyvan

**Şivik:** Darikên zirav û dirêj
**Gurz:** Qevdik, baq

## Em Têbigihin

**1-** Bûyer di navbera kê û kê de derbas dibe?
**2-** Cotkarî, dixwest zarokên wî ji hev re çawa bin?
**3-** Cotkarî, çawa zarokên xwe ezmûn kirin?
**4-** Bûyerê zindî bikin?

## Rêziman

Hevoka li jêr bixwînin û binêrin ka bêhnok li ku derê tê danîn. Hevokê di lênûsa xwe de binivîsin.



*Cotkarî got: Ji hev hez bikin, alîkariya hev bikin.*

# EM BI BERFÊ DILÎZIN



Ji êvarê de berf barîbû. Xanî di bin berfê de mabûn. Derdor bi rengê spî xemilîbû. Zarokên gund, dema ji xewê rabûn, dîtin ku hemû derdor bi berfê spî bûye. Tev derketin kolanan. Li kêleka malan, bûka berfê çêkirin. Kumek danîn ser serê wê. Piştre ew dan ber gulatên berfê.

Azad gazî hevalên xwe yên ku xwe li ser berfê dixişikandin kir:

-Sîpan! Xişînekê baş bigire, tu yê bikevî.

Bêrîvanê kenzeyê xwe yê hirî li xwe kir û çû nav hevalên xwe. Bi hev re mîna birûskan ji jor dadiketin jêr.

Bi qêrîn û ken ji xwe re dilîstin.

## Wateya Peyvan

**Gulat:** Guloka berfê
**Xişînek:** Şemîtok, Amûra ku ji bo xişikandina li ser berfê tê bikaranîn.

## Em Têbigihin

**1-** Bi hatina zivistanê re guhertinên li hawîrdora me çêdibin çi ne?
**2-** Bêrîvanê çima kenzeyê hirî li xwe kiribû?
**3-** Zarokan ew roj çawa derbas kirin?
**4-** Azêd çima gazî hevalên xwe kir?

## Rêziman

Pêwîst e em di hevokên jêr de, di navbera kîjan peyvan de bêhnokê bi kar bînin?
Zarokên gund dema ji xewê rabûn dîtin ku hemû derdor bi berfê spî bûye.
Sîpan! Xişînekê baş bigire tu yê bikevî.

## HÎNDARÎ

Lîstika xwe ya roja berfê, bi çend hevokan bidin nasîn.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Ji mînaka jêr sûdê bigirin û li ser nivîsîna xweşik bixebitin.**

**DARISTAN, JÊDERA DEWLEMENDIYA WELÊT E!**




# TEST 2

**1- Ji vebijêrkên li jêr ya rast nîşan bikin.**

**a- Ji navên ku yek tiştî bi tenê vedibêjin re çi tê gotin?**

**1-** Navên heyberî
**2-** Navên yekjimar
**3-** Navên pirjimar



**b- Ji tebayên li jêr kîjan ne kedî ye?**

**1-** mirîşk
**2-** şêr
**3-** se

**2- Ji hevokên li jêr, yên rast bi tîpa (R) û yên şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin:**

**a-**Helbesta ”Ey felek” berhema Cegerxwîn e. (...)
b-Bajarê Kobanê dikeve bakurê Kurdistanê. (...)

**3- Kîjan navên li jêr di mijara “Em Bi Berfê Bilîzin” de derbas dibin?**

**a-** Sorgul, Aras, Şiyar
**b-** Azad, Sîpan, Bêrîvan
**c-** Şêrwan, Kewê, Mezlûm

**4- Pevên li jêr bigehinin wateya wan.**

| | | | |
|---|---|---|---|
| **xak** | **dewl** | **dilşa** | **gurz** |
| **dilxweş** | **qevdik** | **satil** | **ax** |

# BEŞA 3

## MAMIK

- Taca zêrîn e, di serê her kesî de nîne. (Aqil)
- Hûr hûr barî, hey hey barî, spî kir her çar alî. (Berf)
- Xatûneke kiras reş, tama devan dike xweş. (Beroş)
- Sêniya cam, tejî mercan. (Esman û stêrk)
- Xatûna çil kezî, li pişt malê dibezî. (Mirîşk)



## HÎNDARÎ

Hûn jî li malê çend mamikan peyda bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.



## KURDÎ XWEŞ E

Kurdî xweş e xweş e
Wek gula sor geş e
Tak rihan bi bîn e
Ew ji me re şirîn e

Dinya kurdan nas kir
Zimanê wê hez kir
Ziman dê kurdî
Dilê tevan xweş kir

Bilbil çû ser darê
Bi kurdî got yarê
Mêrên kurdan werin
Bibin hunerkarê

Kurmancî sorgul e
Li ser darê bilbil e
Ser darê şîn geş bû
Vekir sor simbil e

ARAM DÎKRAN



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Yek ji we bibe Hindo, yek jî bibe Rindo. Nivîsê weke hûn li hemberî hev biaxivin, bixwînin.**

## HINDO Û RINDO




*Rindo*: Rojbaş!
*Hindo*: Rojbaş Rindo.
*Rindo*: Tu çawa yî, baş î?
*Hindo*: Baş im, sax bî Rindo.
*Rindo*: Tu bi kû ve diçî? Diçî êş?
*Hindo*: Naçim êş? Diçim dibistanê.
*Rindo*: Ka lê binêre! Ma piştî vî temenî kes diçe dibistanê?
*Hindo*: Çima naçin? Ez ê bixwînim û fêr bibim.
*Rindo*: Here, Here! Bixwîne, da ku tu jî fêr bibî.
*Hindo*: Ma temen ji fêrbûnê re heye?
*Rindo*: Di vê demê de zarok diçin dibistanê. Tu mirovekî mezin î, weke zarokan diçî dibistanê.
*Hindo*: Na Rindo, na. Viyan li dibistanê ye. Niha wê ji waneyê derkeve û ez ê bibim malê.
*Rindo*: Ka te digot temenê çûyîna dibistanê tuneye!

## Wateya Peyvan

**Temen:** Jî, emir

## Em Têbigihin

**1**-Dema Hindo û Rindo rastî hev tên, çawa silav didin hev?

**2**-Hindo, ji ber çi diçû dibistanê?

**3**-Hindo ji bo çûna dibistanê, çi bersiv da Rindo?

## HÎNDARÎ

**Hevokên li jêr bi awayekî rast û xweşik di lênûsa xwe de binivîsin.**

Adar xemla Biharê ye.
Xemla çiya, dewlemendiya welêt e.
Çiyayê Agirî, bilindtirîn çiyayê Kurdistanê ye.

## Rêziman

**1-** Rindo, Hindo û Viyan navên taybet in.
Ew di nava hevokê de bi tîpên çawa hatine nivîsîn?

**2-** Li dawiya hevokên li jêr, nîşaneya pêwîst bi kar bînin.

Tu çawa yî, baş î….
Tu bi kû ve diçî….
Ez naçim êş, diçim dibistanê…

# XAÇEPIRS

**Navê navdarên li jêr, di xaçepirsê de bibînin:**



Aram

Eyşe Şan

Tîrêj

Cegerxwîn

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| S | Q | U | A | H | U | W | O | P |
| E | B | S | E | M | E | Ş | S | T |
| L | A | R | A | M | Y | Î | Ş | Î |
| E | K | E | M | T | Ş | F | I | R |
| S | Û | P | A | Y | E | N | M | Ê |
| G | Y | U | F | N | Ş | Û | W | J |
| Z | X | J | I | V | A | Q | S | A |
| T | Î | Ê | S | R | N | A | Ê | T |
| C | E | G | E | R | X | W | î | N |

# NEXWEŞIYA DAYÎKÊ



Roza, weke her dem zû radiza. Li ser nivîna xwe demekê xilmaş bûbû. Ji nişka ve dengek bihîst. Roza beziya odeya dayîka xwe, dayîka wê dinaliya.

Roza: Yadê, yadê!

Dayîka wê bersiv neda. Xwest ku wê bi maçîkirinê ji xewê rake. Dayîka wê ta girtibû. Bi lez û bez agahî da xwişka xwe Hêlînê. Piştre çû desmal şil kir, anî û danî ser serê dayîka xwe. Dayîka Rozayê çavên xwe piçekî vekirin. Sê caran li ser hev got:

- Ax! Axx! Axx!

Wê demê Hêlîn hat. Pileya germbûna dayîka xwe pîva. Pileya germbûna wê gelek bilind bû. Telefonî bijîşk kir. Bijîşk hat. Lê nêrî û derziyek lêda .

Roza:

- Dayîka min, tu baş bûyî?

Dayîk:

- Ez baş bûm; giyana min.

Bijîşk:

-Heke di destpêkê de Rozayê desmal şil nekiribûya û nedaniya ser serê te, wê êşa te girantir bibûya.

## Wateya Peyvan

**Bijîşk:**Doxtor, hekîm
**Pile:** Ast, derece
**Giyan:** Can, ruh

## Em Têbigihin

**1-** Roza çawa têgihişt ku dayîka wê nexweş e?
**2-** Çima destmala şil danî ser serê dayîka xwe?
**3-** Hêlînê ji bo saxbûna dayîka xwe çi kir?

## Rêziman

**1-** Valehiyên li jêr dagirin.
Bi lez …bez agahî da xwişka xwe Hêlînê.
Roza beziya odeya dayîka …….
**2-** Van kiteyên li jêr bikin hevok.
***Di wê de-mê de Hê-lîn hat.***

## HÎNDARÎ

Ji bo em nexweş nekevin, pêwîst e em çi bikin? Li ser vê mijarê çend hevokan binivîsin.
Dema hûn dinivîsin, vê rêbazê bişopînin.
Hizrên xwe bibêjin.
Hevokên xwe hilbijêrin û li ser depê binivîsin.
Nivîsa xwe bixwînin. Ger şaşiyên we hebin, sererast bikin.
Li gorî nivîsê sergotarekê bibînin.

## MIJARA SERBEST

# CEJNA 8'Ê ADARÊ






Dema Bihar tê, xweza rengereng xwe dixemilîne. Di Biharê de gul û kulîlk vedibin. Dengê awaza çûk û teyrikan mirov şad û bextewar dike. Lewra Adar mizgîniya Biharê ye. Di vê mehê de gelek rojên me yên taybet û pîroz hene.

Yek ji wan rojan jî 8'ê Adarê ye. 8'ê Adarê roja jinên kedkar ên cîhanê ye. Li tevahî cîhanê hemû jinên kedkar vê rojê pîroz dikin. Jinên kurd jî vê rojê bi dilşadî pêşwazî dikin.

Ez û dayîk û xwîşka xwe jî cilên xwe yên herî rengîn li xwe dikin û tevlî pîrozbahî û çalakiyên vê rojê dibin. Ev roj, çoş û kelecaneke mezin dixe dilê min. Vê rojê her kes dibêje: "Jin, jiyan azadî." Tê wateya: jin jiyan e; Jiyan bi azadiyê xweş e. Bi taybetî, di pîrozbahiyê de dema govend tê gurkirin û her kes tevlî dibe pê şad dibim. Bi rastî pîrozbahiyên vê rojê hest û bîranînên pir xweş di hişê min de dihêlin. Ji bo wê ez di vê rojê de gelek hestiyar û kêfxweş dibim.

## HÎNBÛN

**Navê jinên navdar ên Kurd di xaçepirsê de bibînin.**

**Viyan**

**Arîn**

**Bêrîtan**

**Ronahî**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| A | R | Î | N | Z | Ç | B |
| I | E | T | Û | K | D | Ê |
| R | M | Y | S | U | E | R |
| O | T | F | Î | R | H | Î |
| N | A | q | J | Ş | L | T |
| A | V | I | Y | A | N | A |
| H | R | S | Z | R | O | N |
| Î | E | P | O | A | W | T |

# HÊLÎNA PAQIJ






Hêlîn, keçeke jêhatî û paqij e. Di malbateke paqij de dijî. Hêlîn sibehê zû radibe, dest û çavên xwe dişo. Cil û bergên paqij li xwe dike. Dema ku di kolanan de dimeşe, kolanan gemar nake û paqij dihêle, ji ber ku paqijî nirxek ji çanda mirovan e.

Mamosteyên wê jê xweş in, ji ber ku hevalên xwe jî fêrî paqijiyê. Paqijî ji tenduristiya mirov re pêwîst e. Ji ber vê yekê, Hêlîn jiyaneke serkeftî dijî. Ji bo wê, paqijî di jiyana wê de xala herî girîng e. Bi vê sedemê, Hêlîna pak cihekî xwe yê taybet di nava hevalên xwe de çêkiriye.

## Wateya Peyvan

**Laş:** Gewde, beden
**Pak**: Paqij

## Em Têbigihin

**1-**Hêlîn keçeke çawa ye?
**2-**Ji ber çi pêwîst e mirov xwe paqij bike?

## Rêziman

**1-** Peyvên li jêr rast bixwînin û binivîsin.
"kolan, paqijî"
**2-** Hevokê li jêr kite bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.
"Hêlîn sibehê zû radibe ser û çavên xwe dişo."

## HÎNDARÎ

Divê mirov çawa xwe ji qirêjiyê biparêze, bi çend hevokan di refa xwe de ji hevalên xwe re vebêjin.

# ADAR E

Adar e xweş adar e
Dem dema kêf û kar e
Tu bi xêr hatî adarê
Digel bûka biharê
Serma revî çû nema
Hat çaxê geşt û sema
Hate va sersala me
Şahî xiste mala me

Newroz e, xweş Newroz e
Cejna me ya pîroz e
Awazên eşqa kevnar
Dagirtin dol û zinar

## Wateya Peyvan

**Sema:** Govend, toreya baweriya Elewiyan
**Geşt:** Ger, seyran
**Eşq:** Evîn

# NEWROZ Û ZAROK





Bi çirûskên agirê newrozê keç û xort bejna xwe dixemilînin; bi firişteyên bihara rengîn, Şirîn û xweşik dibin. Bayê bihara newrozê bang dike, di guhê zarok û ciwanan de dibêje: vaye ez hatim, silav ji we re zarokên delal.

Zarok dibêjin: Tu bi xêr hatî Newroza me, dîsa geş dikî dilên me.

Newroz dibêje: Ez jî şad dibim bi dîtina we. Ger dilên we şad bikim, mezintir û xweşbîntir dibim.

Zarok dibêjin: Her sal em li benda hatina roja 21'ê Adarê ne. Dema tu tê, agir geş dibin. Şev bi tîrêjên te ronî dibin. Em jî li dora agirê te dîlanê dikin û bixêrhatina te dikin.

Newroz dibêje: Ez dilşad dibim ku hûn bi çavên xwe yên bi hêvî bendewarê dîtina min in. Ez ê tim we rûken bikim dilê we geş bikim.

Zarok dibêjin: Newroza azadiyê, em jî spasiyên ji dil pêşkêşî te dikin.

Newroz dibêje: Dê niha bi xatirê we zarokên delal. Heya careke din tim azad bijîn.

Zarok dibêjin: Tu bixêr biçî sembola jiyana azad. Bi hêviya dîtina te, em ê li benda te bin.

## Wateya Peyvan

**Newroz:** Roja nû
**Geşkirin:** Gurkirin
**Firişte:** Milyaket, melek
**Xweşbînî**: Xweş dîtin
**Şad:** kêfxweş
**Çirûsk**: Dema agir gur dibe, ew agirê hûrik yê ku jê diçe
**Bendewar**: Çav li riyekî

## Em Têbigihin

**1-** Newroz kîjan rojê tê pîrozkirin?
**2-** Roja Newrozê zarok çi dikin?
**3-** Li gorî mijarê guftûgo di navbera kê û kê de derbas dibe?

## HÎNDARÎ

**1-** Roja Newrozê ji bo we tê çi wateyê? Bi çend hevokan şîrove bikin.
**2-** Amadekariyên Newrozê çawa tên kirin?

# ROJBÛNA HERJÎNÊ



Herjîn di 12’ê Sibatê de, wê bikeve 8 saliya xwe. Dixwest rojbûna xwe li malê bi hevalên xwe re pîroz bike. Gelek kêfa dayîk û bavê wê ji bo vê yekê dihat.

Dibistan di bêhnvedana nîvsalê de bû. Ji ber vê yekê, derfet nebûn ku hemû hevalên xwe bibîne. Beriya vê bi demekê navnîşana hevalên xwe stendibû.

Hîna pênc roj ji rojbûna wê re mabûn, Herjînê vexwendnameya li jêr, ji bo hevalên xwe nivîsî.

**Hevalên hêja,**

*Roja 12'ê Sibatê, rojbûna min e. Ez dixwazim rojbûna xwe bi we re pîroz bikim. Bi hatina we ez ê bextewar û şanaz bibim. Wê rojê di demjimêr 12:00'an de ez ê li malê li benda we bim.*

*Silav û hezkirin.*

*Herjîn Amedî*

## Wateya Peyvan

**Derfet:** Delîve, fersend, keys
**Navnîşan:** Adres, nav û nîşanê cihekî
**Bextewar:** Kêfxweş, dilşa

## Em Têbigihin

**1-** Herjînê ji ber çi hevalên xwe vexwendin malê?
**2-** Herjînê di vexwendnameya ku ji bo hevalên xwe nivîsî de çi diyar kiribû?

## HÎNDARÎ

1- Kajîn, tevlî rojbûna Herjînê nebûbû. Ji ber vê yekê, pîrozbahiya li jêr nivîsîbû.

***Hevala hêja Herjîn:***

*Ez rojbûna te pîroz dikim. Rojên xweş û geş ji te re hêvî dikim.*

***Silav***

***Kajîn Aştî***

Hûn jî, ji bo hevalên xwe nameyeke pîrozahiyê binivîsin û sala wan a nû pîroz bikin.

# PÊKENOK

## Di pey A’yê re kîjan tîp tê?

**Li dibistanê mamoste ji Lezgîn dipirse:**

**- Lezgîn tu hemû tîpên abeceyê dizanî?**

**- Belê mamoste, ez dizanim.**

**- De ka bêje, li pey tîpa A’yê kîjan tîp tê?**

**- Li pey tîpa A’yê hemû tîp tên.**



# XEZAL Û MASÎ





Li gundekî xezalek hebû. Rojekê li peravê Gola Wanê masiyekê dibîne. Di demeke kin de dibin hevalên hev.

Masî, ji xezalê re dibêje:

- Xwîşka xezal, cihê hûn lê dijîn, ez dixwazim bibînim.

Xezalê got:

- Fermo em bi hev re biçin.

Her du bi hev re ketin ser rê. Ji avê sê-çar gavan dûr dikevin. Masî diqîre:

-Hewar!.. Bêhna min çikiya.

Xezalê bi simê xwe masî avêt nav avê. Bêhna masiyê fireh bû.

Vê carê xezalê xwest biçe mala masiyê. Rojekê her du bi hev re ji bo ku biçin mala masiyê xwe berdidin nava golê. Dema ku avê da ser bejna xezalê, wê jî kire qîr û hewar!..

-Ez xeniqîîîm, xeniqîm!

Masiyê, ber bi peravê golê ve avjenî kir. Li xezalê zivirî û got:

Xwîşka xezal min bişopîne.

Xezalê masî şopand û ji xeniqînê rizgar bû.

Vêca, ya baş ew e ku her kes li warê xwe bijî.

# GURÊ NALBEND



Rojekê hespek di nava mêrgekê de ji xwe re diçêriya. Gurek dît û veciniqî. Gur:

- Ez nalbend im, hespan nal dikim.

Hespî li mebesta gur a xerab nêrî û got:

- Fermo mamê gur, were simên min nal bike.

Gur hat, xwe nêzîkî hespî kir û devê xwe avêt simên hespî. Lê belê hesp ji wî zîrektir bû. Bi hêza xwe pehîn li dev û lêvên gur da. Tevahiya diranên wî hûrhûr kirin. Heya demekê hişê wî hat serî. Piştî vê bûyerê gur bazda. Li xwe nêrî û got:

Ma bavê te nalbend bû, bapîrê te nalbend bû. De bixwe! Bila ev rewşa te be!

## Wateya Peyvan

**Nalbend:** Kesên ku hesp û hêstiran nal dikin.
**Bûyer:** Rûdan, qewimîn
**Mebest:** niyet, daxwaza di dil de

## Em Têbigihin

**1- Bûyer di navbera kîjan lawiran de derbas bûye?**
**a)** rovî û hesp
**b)** gur û ker
**c)** gur û hesp
**2 - Hespî ji gur re çi got?**
**a)** Fermo were min bixwe.
**b)** Fermo mamê gur, were simên min nal bike.
**c)** Mamê gur tu fêlbaz î.
**3-Di dawiyê de çi hat serê gur?**
**a)** Diranên wî hûrhûr bûn.
**b)** Gur bi saxî bazda.
**c)** Gur û hesp bûn hevalên hev.

# TEST 3

**1- Ji vebijêrkên li jêr ya rast nîşan bikin.**

**a- "Zozan hêj neçûbû dibistanê." Ev hevok ji çend peyvan pêk hatiye?**

**1-** 3
**2-** 4
**3-** 5

**b- Di her kiteyeke peyva "azadî" de çend tîpên dengdêr hene?**

**1-** yek
**2-** du
**3-** sê

**c- Nivîsîna kîjan peyvên li jêr, rast e?**

**1-** pênnûs
**2-** jîbir
**3-** pirtûk

**2-ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R) û ya şaş bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

a- Peyva 'pênûs' sê kite ne. (...)

b- Di dawiya nivîsa "Li çiyê berf barî" de nîşaneya xal tê bikaranîn.(...)

**5- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.**

bextewar pak bûyer

paqij keyfxweş rûdan

# BEŞA 4

## RÊHEVAL




Rojekê, Mêrxas dixwaze ji bajarê Amûdê biçe Qamişloyê. Rêhevalê wî pîremêrek bû. Her kesî ji wî pîremêrî re digot bapîr.

Bapîr, di tirimpêlê de, 'Rojnameya Ronahî' ji çentê xwe derxist.

Got:

-Tu dixwazî bixwînî Mêrxas?

**Mêrxas:**

-Naxwazim. Tu bixwîne.

**Bapîr:**

-Ez xwendinê nizanim.

**Mêrxas:**

-Lê tu çima rojnameyan dikirî?

**Bapîr:**

Ez her tim dikirim. Lê yekî din ji min re dixwîne.

Mêrxas, "Rojnameya Ronahî" girt, rûpelên wê vegerand û got:

-Niha tu dixwazî ez jî ji te re bixwînim?

**Bapîr:**

-Wey, tu gelek bijî! Lê hêdî bixwîne.

Mêrxas, dest bi xwendina rojnameyê kir. Bapîr gelek şad bû. Her du rêhevalên hev nezanîn ka çawa gihîştin Qamişloyê.

## Wateya Peyvan

**Rêheval:** Hevalê rê

**Tirimbêl:** Bas, otombîl, maşîne

## Em Têbigihin

1-Axaftin di navbera kê û kê de derbas dibe?

2-Çima, bapîr rojname nedixwend?

3-Bapîr û Mêrxas ji kû derê, diçûn kû derê?

## HÎNDARÎ

Hûn danûstendina di navbera bapîr û Mêrxas de çawa dibînin?

Hûn jî rêwîtiyeke xwe bi bîr bînin û binivîsin.

## Rêziman

**1-** Di mijarê de, destpêka hevokan bi tîpa mezin tê nivîsîn. Hevoka li jêr ji mijarê hatiye girtin, lê bi awayekî tevlîhev hatiye nivîsîn. Peyvên vê hevokê, bi awayekî rast rêz bikin û di lênûsa xwe de binivîsin.

*Amûdê Mêrxas dixwaze Rojekê, ji bajarê biçe Qamişloyê.*

# MORÎ Û KEVOK





Morî, ji bo vexwarina avê, çû ser golê. Lingê wê şemitî. Moriyê xwe di nava avê de dît. Bi qêrîn û hewar, alîkarî xwest. Di wê demê de kevokek di ser wê re difiriya. Ji xwe re got:

"Ka ez alîkariyê bidim vê belengazê, da rizgar bibe." Qirşikek berda nava avê. Moriyê xwe bi qirşikê girt û derket.

Morî:

- Wey tu sax bî xwîşka kevok. Ez ê vê qenciya te ji bîr nekim.

Kevok kenî û got:

- Tu yê çi qenciyê li min bikî!

Çend roj şûnde, nêçîrvanekî bi tifinga xwe nîşan li kevokê girt.

Di wê kêliyê de, çavê moriyê li nêçîrvanî ket. Bi lez xwe gihand nêçîrvanî. Gezek li gûzeka wî da. Nêçîrvan li ser êşa gûzeka xwe veciniqî û nîşana xwe şaş kir. Kevokê jî ev rewş dît, firiya û bi vî awayî rizgar bû.

## Wateya Peyvan

**Veciniqîn:** hilceniqî, ji nişka ve hay ji tiştekî bûn

## Em Têbigihin

**1-** Giyandarên di çîrokê de cih digirin kîjan in?
**2-** Kevokê çawa morî rizgar kir?
**3-** Moriyê çawa qencî ji bîr nekir?

## Rêziman

**1-** Di mijarê de, destpêka hevokan bi tîpa mezin hatiye destpêkirin an na?

**2-** çend Hevokên ku di mijarê de, bi nîşaneya xal (.) an jî cotxalê (:)bi dawî bûne, di lênûsa xwe de binivîsin.

# DARA HINARÊ





Di nava dehlekî de, dareke hinarê hebû. Di qurmê darê de, koremişk û kurmikên axê dijiyan. Li ser gewdeya wê morî û kêzik hebûn. Li ser çiqilên bilind jî mêş vediniştin.

Rojekê, dara hinarê wiha got:

-Mêvanên hêja! Ka bêjin hûn ê heya kengî di mala min de bimînin? Hûn tiştekî xwe jî nadin min?

Koremişkî jê re got:

- Ma tu nizanî? Xebata me sûdê dide te jî. Bi şev û roj em ber rehên te dikolin. Bi vî awayî tu zêdetir rehên xwe berdidî nava axê. Lewre tu jî geş dibî. Mêşan jî wiha dest bi gotinê kir:

- Heke awazên me yên xweş tunebûna, dê di giyana te de tengezarî çêbûbûya. Em bi awazên xwe, te pir şad dikin.

Bi vî rengî dara hinarê, zanî ku mêvanên wê sûdê didinê. Careke din ev gazin ji zindiyên derdora xwe nekir.

## Wateya Peyvan

**Qurm:** Bin gewdeya daran
**Awaz:** Mûzîk

## Em Têbigihin

**1-** Di çîrokê de axaftin di navbera kê û kê de çêdibe?
**2-** Mêvanên dara hinarê, di kîjan beşê wê de diman?
**3-** Çima dara hinarê dev ji gazinan berda?

## Rêziman

**1-** Komepeyva li jêr, di lênûsa xwe de binivîsin. Di komepeyvê de ‘ên’ derbas dibe. Binê wê xêz bikin.

*Mêvanên hêja!*

Qertafa ‘ên’ rakin û komepeyvê bixwînin. Di wateyê de çi guhertin çêdibe?

**2-** Cudahiya di navbera hevokên jêr de çi ye?

Di nava dehlekî de dareke hinarê hebû.

Di nava dehlekî de darên hinaran hebûn.

## HÎNDARÎ

**1-** Bûyerên di çîrokê de derbas dibin bi rêzê ve bêjin.

**2-** Di demsala biharê de, li bax û bîstanan çi kar tê kirin? Di xwezayê de çi guherîn çêdibin?

# SÊ PERPERÎK



Di mêrgekê de sê perperîk dijiyan: Yek spî, yek sor û yek jî zer bû. Bi şahî ji kulîlkekê difiriyan ser yeke din.

Ji nişka ve dengek ji ezmanan hat. Ewr li hev civiyan û baranê dest pê kir. Her sê perperîk, firiyan û çûn cem şilêrê, jê re gotin:

- Şilêra rindik, tu dikarî me ji şilbûnê biparêzî?

**Şilêrê:**

- Ez ê perperîkên sor û zer ji baranê biparêzim; lê ez perperîka spî naparêzim.

**Perperîkên sor û zer** gotin:

- Ger tu xwîşka me ya spî jî neparêzî, em jî nayên cem te.

Her sê perperîk çûn hêvî ji nêrgizê kirin.

**Nêrgiz:**

- Ez ê perperîka spî ji şilbûna baranê biparêzim; lê ez perperîkên sor û zer naparêzim.

**Perperîka spî** got:

- Ger tu her du xwîşkên min ji baranê neparêzî, ez jî nayêm cem te. Her sê perperîk bi hev re firiyan.

Dema rojê, hevalbendiya ji dil û can a her sê perperîkan dît. Bi germahiya tîrêjên xwe ewr belav kirin, baran rawestand û her der ronî kir.

Bi vê yekê re her sê dostên dilsoz, bi hev re di nava şahiyê de dîlan kirin û ji nû ve firiyan, firiyan, firiyan ...

## AMÛRÊN ME YÊN DIBISTANÊ

Amûrên me yên dibistanê, alîkarên me yên herî girîng in. Pêwîst e em li wan amûran xwedî derkevin. Divê em, kesên ku li wan xwedî dernekevin hişyar bikin.

Ji wêneyên li jêr kîjan amûrên me yên dibistanê ne? Wan bi reng bikin.
















# 19'Ê TÎRMEHÊ






Roja 19' ê Tîrmehê çirûska azadiyê ji Kobanê bilind bû, çiqên xwe belavî hemû xaka Rojavayê Kurdistanê kirin û bi awayekî reng û reng ji azadiyê ber bi Efrîn û Cizîrê ve herikî.

Di vê rojê de gelek bajarên Rojavayê Kurdistanê ji destê rêjîma nijadperest (Baas) hatin rizgarkirin. Bi vî awayî, kurdan li Rojava zêdetir xwe bi cih kirin. Awayê xwe yê civakî û rêxistinî ava kirin. Hêza xwe ya leşkerî YPG'ê û YPJ'ê ava kirin. Di bin navê gelek saziyên din de xwe bi rêxistin kirin. Belê, weke civaka Rojava, me gelek berdêl di vê riyê de dan. Gelek keç û xortên me yên leheng, di vê riyê de şehîd bûn.

Lê tevî vê yekê jî, me têkoşîna xwe xurtir kir û di encamê de gelek destkeftî hatin bidestxistin.

Bi vê boneyê, em her sal roja 19'ê Tîrmehê bi coş û kêxweşiyeke mezin pîroz dikin. Em zarok jî cilên xwe yên herî xweşik li xwe dikin. Di vê rojê de zarok, jin, kal û ciwan dubare dibêjin: "Ji azadiyê xweştir û bedewtir tiştek tuneye." Her kes di dil de kêxweş û rûken dibe.

## Wateya Peyvan

**Nijadperest:** Yê ku netewa xwe ji yên din pîroztir dibîne, Şoven
**Şehîd:** Canfida, pakrewan
**Bone:** Munasebe
**Bedew**: Xweşik, ciwan

## Em Têbigihin

**1-**Di roja 19'ê Tîrmehê de çi çêbûye?
**2-** Navê hêzên parastinê yên li Rojava çi ne?
**3-** Em roja 19'ê Tîrmehê çawa pîroz dikin?

## Rêziman

**1-** "*Pakrewan, azadî, Tîrmeh, Rojava*" Her peyvekê di nava hevokekê de bi kar bînin.
**2-** "*Em zarok jî cilên xwe yên herî xweşik li xwe dikin.*" Di vê hevokê de "*em*" cînavk e. Cînavk cihê nav digire û rola nav dilîze.
**3-** "*Efrîn, reng, bajar*" Ji van navan, kîjan jê taybet e?

# GOTINÊN PÊŞIYAN

- ***Peza ji kerî diqete, para gur e.***

"Ev pend, tê wateya kesê ji gelê xwe veqete, wê rastî gelek zorî û nexweşiyan bê."

- ***Her giya li ser koka xwe şîn dibe.***

"Ev pend, tê wateya ku her civak li ser çand û dîroka xwe pêş dikeve."

- ***Şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e.***

"Ev pend, tê wateya wekheviya mirovan."



# DAYÎKA MIN



Ey dayîka şîrîn û rind û delal
Te ez mezin kirim bi şîrê zelal
Tu her roj min amade dikî li mal
Ji bo pêşxistinê, bûyî pişt û pal

Ey dayîka xoşdiviya dilovan
Min dixemilînî bi cil û bergan
Bi ramûsan min dişînî dibistan
Da nebim paşketî, paşverû, nezan

Da ez zana bibim xwedanê rûmet
Ciwanek pêşketî bi hêz û serwext
Wekî bab û kalan nemînim bindest
Ez dixwazim bibim azad û serbest

## Wateya Peyvan

**Xoştivî:** ezîz, delal
**Paşverû:** Paşmayî, paşketî
**Ramûsan:** Maçkirin

## Em Têbigihin

**1-**Zarok, kîjan taybetiyên dayîka xwe vedibêje?
**2-**Pêşxistin û xwedîkirin, di kîjan malikê de diyar dibe?
**3-**Dayîk zarokên xwe çawa dişîne dibistanê?

## Rêziman

Hevokên jêr di lênûsa xwe de binivîsin. Li dawiya hevokan nîşaneyên pêwîst bi cih bikin.

*Bi ramûsan min dişîne dibistan*
*Ez dixwazim bibim azad û serbest*

## HÎNDARÎ

**1-** Helbestê ji dayîka xwe re bixwîne.

# COTKAR Û DAR



Carekê ji caran, di zeviya cotkarekî de dareke mezin hebû. Tu caran fêkî nedigirt. Tenê sîbera wê hebû.

Cotkar hizirî û ji xwe re got: Ez ê çi ji darek wiha bêber bikim? Ji ber siya pelên wê tu şînahî li binê darê şîn nayê. Cotkarî dest avête bivirê xwe û heya jê hat li qurmê darê xist.

Di wê demê de, beytik û çirçirk bi ziman bûn û gotin:

- Xalê Cotkar, em hêvî dikin ku tu vê darê nebirî! Lewre ev dar stargeha me ye cihê jiyan, şahî û dîlanên me ye.

Lê mixabin, cotkarî li wan guhdar nekir. Bivirê xwe rakir û li pey hev li qurmê darê xist. Kunek mezin di darê de vekir. Ji darê şilxek mêşên hingivî derket.

Çavên cotkarî zîq man, tiliya xwe lê xist û xist devê xwe de. Hingiv jî çi hingiv bû! Bivir ji destê xwe avêt. Ji wê rojê û pê ve, cotkarî êdî weke çavên xwe li darê dinêrî.

Gelo hûn dizanin ku hinek mirov, mafê heyînan bin pê dikin. Her dem li berjewendiyên xwe digerin.

## Wateya Peyvan

**Sîber:** Sî, sih
**Şilx:** Şilih, koma mêşên hingivî yên nû
**Berjewendî:** Sûdperestî

## Em Têbigihin

**1-** Çima cotkarî dara di nava zeviya xwe de dibirî?
**2-** Çima beytik û çirçirkan nedixwest dar bê birîn?
**3-** Çi bû sedem ku, cotkarî dest ji birîna darê berda?

## Rêziman


Peyvên li jêr, li gorî rêza tîpan rêz bikin.
"*bivir, dar, em, zevî, cotkar, mêş, hingiv*"

## HÎNDARÎ

**1-** Encama ku we ji vê mijarê girtî di lênûsa xwe de binivîsin.
**2-** Çîrokeke ku we ji derdora xwe guhdar kiribe, ji hevalên xwe re vebêjin.

# MAMIK

- Mamosteyê mala min e, aqildar e, rih tê nîne. (Pirtûk)
- Xişt û xişt ber derî rûnişt. (Melkes)
- Çeqmeq e çeqûleq e, yê destê xwe bidê ehmeq e. (Dûpişk)
- Kumê sorik, tejî morik. (Hinar)
- Karika kejik, li ser hejik. (Mûz)
- Hespê boz, meydan kir toz. (Aş)



# DU PÊŞBIRKVAN

Kêvroşkekê di civata lawiran de pesnên xwe dan û axivî:

- Ez ji hemû lawiran bezatir im.

Kîso derket pêş û got:

- Ez ji pêşbirkeke bezê re amade me.

Kêvroşkê zanî ku kîso bi biryar e. Pêşbirkê destpê kir.


Kêvroşk, bi lez çû pêş û ji ber çavan winda bû. Kîso jî, bi rêveçûyîna xwe ya em pê dizanin, kete ser rê.

Piştî ku Kêvroşkê qederek ji rê derbas kir, li binê darekê rûnişt û got: hema her ez ê bi ser bikevim, ya baş ew e ku ez hinekî ji xwe re rakevim.

Kîso bi hemû hêza xwe dibeziya û di ber kêvroşka razayî re derbas bû. Dema kêvroşk ji xewê şiyar dibe, kîso li ber qedandinê bû.

Kêvroşk:

Çawa be ez ê bigihim wê. Ji nû ve bezî. Kîso, bi çepikên lawiran beza xwe qedandibû. Kîsoyê bi hewldan û baweriya xwe xelata pêşbirkê stend. Lê kêvroşk, ji ber ku pir ji xwe razî bû, xwe sist kir û pêşbirk winda kir.



## Wateya Peyvan

**Pêşbirk:** Hevrikî, berebezî
**Pesin:** Xwe mezinkirin, zirt
**Xelat:** Perû, diyarî

## Em Têbigihin

**1-** Pêşbirka kîso û kêvroşkê çawa berdewam kir?
**2-** Çima kêvroşkê pêşbirk winda kir?

## Rêziman

**1-** Peyva 'kîso' û 'kêvroşk' di nav hevokê de bi kar bînin.

***2-*** "*Kîso bi hemû hêza xwe ve dibeziya.*" Di vê hevokê de peyva **'dibeziya'**kar dide diyarkirin.

## HÎNDARÎ

Lawirên ku hûn dinasin di refê de bi çar-pênc hevokan şîrove bikin.

# HEVALÊN MIN

**Hûn tevlî kîjan nêrîna/nêrînên li jêr dibin?**



# TEST 4


**1- ji vebijêrkên li jêr ya rast nîşan bikin.**

**a- Tîpên ku li jêr hatine rêzkirin, kîjan jê bi tenê yên dengdêr in?**

**1-** a-e-ê-i-î-o-u-û

**2-** a-b-c-ç-d-e-ê-f

**3-** e-ê-a-i-î-o-û-c



**b- Di kîjan hevoka jêr de navê pirjimar heye?**

**1-** Ez ji dibistanê hez dikim.

**2-** Min ji hevalên xwe re got.

**3-** Dilvîn xwendekareke jîr e.

**c- Ji navên li jêr kîjan navê giyaneweran e?**

**1-** ber

**2-** mêş

**3-** pênûs

**2- ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R) û ya şaş bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

**a-** Kêvroşk di rê de raza, ji ber wê jî kîso bi ser ket. (...)

**b-** Moriyê hêvî ji nêçîrvan kir ku kevokê nekuje. (...)

3- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.

sîber pakrewan awaz

şehîd mûzîk sî


Deryay Reş
Gurcistan
Rûsya
Ermenistan
Azerbeyca
Turkîya
KURDISTAN
IDIR
Qers
Sewas
Erzincan
EZEROM
Agrî
Bazîd
Mako
Nahcevan
Caldiran
Dersîm
Cewlik
Elezîz
Mûş
Tetwan
Behra Wanê
Wan
Qotûr
Xoy
Bitlîs
Farqîn
Meletî
Elbistan
Firat
Semsûr
AMED
Batman
Sêrt
Başqela
Gever
Sîrnex
Clemerg
Zaxo
Wirmê
Îran
Siverek
Weranşiher
Merdîn
Meras
Besnî
EFRÎN
Entap
KOBANÊ
Riha
AMÛDÊ
Nisêbîn
Cizîr
DERIK
QAMIŞLO
Dicle
Dihok
Nexede
Mihabad
Îskenderûn
Heseke
Mûsil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bîcar
Deryay Sipî
Sûrya
Kerkuk
Silêmani
Merîwan
Sine
Helebce
Îraq
Qesrî-Sirin
Kirmaşan
Xaneqîn
Libnan
Ilam